# MDHA

# Kirêdar: Mafên Xwe Bizanin!

## Di xaniyên gştî yên MDHA de berpirsiyariyên min çi ne?

- **Her sal û her gava ku mezinahiya şêniyên malbata we an dahata we diguhere ji nû ve sertîfîka bikin.** Belgeya dahata malbata xwe bidin rêvebirê milkê xwe.
- **Her meh kirêya xwe bidin.** Ger dahata we biguhere ji rêveberê xaniyê xwe re ragihînin- ew dikare bandorê li kirêya we bike!
- Formên pesendkirin û verastkirinê yên pêwîst **îmze bikin.**
- Kirênameya xwe **BINPÊ NEKIN** an jî tiştekî xeternak nekin/gefa kirinê nexwin. **Mêvanên we jî daxilî vê ne.**
- Tamîrên pêwîst tavilê **bi nivîskî ragihînin xwediyê xaniyê xwe.**

## MDHA kengê dikare hewl bide ku min ji xanî derxe?

**MDHA tenê dikare we ji xanî derxe yan jî JI BER SEDEMEKÊ (ji ber sedemeke taybet) dikare tercîh bike ku kirênameya we nû neke.** Bo nimûne, hûn dikarin di van rewşan de mala xwe winda bikin:

- heke hûn guhertinên dahatê ranegihînin an jî ji xwediyê xanî re behsa kesên ku bi we re dijîn nekin.
- heke hûn kirê nedin an jî carcaran bi derengî bidin.
- heke hûn xanî ne tendurist an ne ewledar bikin.
- Gefxwarina/kirina tiştekî xeternak an neqanûnî.

## Ger MDHA hewl bide ku ez ji xanî derkevim, çi dibe?

- **Heke hûn kirêyê nedin,** hûn **agahdariyeke 14 rojî** werdigirin ji bo dayînê.
- Hûn **agahdariyeke 30-rojî** werdigirin da ku **hema hema hemû pirsgirêkên** din çareser bikin. Hûn dikarin di nav 30 rojan de daxwaz bikin ku bi xwediyê xanî re hevdîtinê bikin da ku pirsgirêkê çareser bikin.
- Ger hûn di nav 14 rojan de kirêyê nedin an jî di nav 30 rojan de pirsgirêkê çareser nekin, **kaxezên dadgehê dê ji we re werin şandin.**

**Heke hûn bi kirina sûcekî an gefxwarina kesên din werin tawanbarkirin, dibe ku hûn di demeke kurttir de agahdariyê wergirin û nikaribin daxwaza hevdîtinê bikin.**

**Ger kaxezên dadgehê ji we re bên, BIÇIN DADGEHÊ!**
**Heke hûn vê nekin, hûn ê bi awayekî otomatîk winda bikin.**

## Di xaniyên gştî yên MDHA de çi mafên min ên din hene?

Heqê we yê derengmayînê tu carî nikare **ji %10ê kirêya we** zêdetir be. Hin ucretên derengmayînê nikarin ji **10 dolaran** zêdetir bin. Kirênameya xwe kontrol bikin!

Hûn nikarin werin derxistin **tenê ji ber ku** deynê we yê ucreta derengmayînê heye.

Xwediyê xanî divê di demeke maqûl de **tamîratên pêwîst** pêk bîne.

Xwediyê xanî divê **qad û tesîsên hevpar** di rewşeke ewle û paqij de bigire.

LEGAL AID SOCIETY (833) 837-HOME

NHBA

KURDISH KURMANJI - MDHA (615) 701-7957

AMAC American Muslim Advisory Council (615) 988-6460

NASHVILLE CONFLICT RESOLUTION CENTER

ROOFTOP NASHVILLE

**Ev agahdarî tenê ji bo Davidson County ye.** Agahiyên li vir hatî dayîn armanc nake ku pêşniyaza qanûnî pêk bîne. Heke pirsgirêkeke we ya hiqûqî hebe, ji kerema xwe telefonî parêzgerekî taybet bikin an telefonî Komeleya Alîkariya Hiqûqî ya Middle Tennessee ya herêmî bikin an jî bi riya hejmara 1-800-238-1443 telefonî ofîsa Cumberlandsê bikin an jî bi riya hejmara 1-615-701-7957 telefonî Yekitiya Baroyan a Nashville Hispanîkê bikin. Di 5/24an de hat revizekirin.